


Nehêle derbasî te û kesên din bibe



Li dûr raweste

Şiyar be ku tu neçî nav kombûnên li deverên teng. Bo nimûne li dikanan, li marketan, li restoranan, li ber deriyê qehwexaneyan û li ciyên ku xelk dikevin avê, dûriyekê biêxe navbera xwe û kesên din.



Gelek caran destê xwe bişo!

Maddeya vegirtinê bi hêsanî bi destê mirov ve dizeliqe û ji wir dikare li ciyên din belave bibe. Gelek caran destê xwe bi sabûn û ava germ bişo, bi kêmanî 20 saniye. Gava sabûn û av tunebe, hingê dikarî alkola destşûştinê bi kar bînî.



Li nav qermûçeka milê xwe bikuxe û bipişke!

Heger tu li nav qermûçeka milê xwe yan li nav destmaleke kaxezê bikuxî û bipişkî, hingê tu nahêlî dilopên biçûk ên bi maddeyên vegirtina nexweşiyê li der û dora te belave bibe yan bi destê te ve bizeliqe. Her dem wê kaxezê bavêje nav qutika ziblê û destê xwe bişo.



Destê xwe nede çav, poz û devê xwe

Dibe zehmet be ku mirov wisa neke, loma destê xwe gelek caran bi sabûn û avê bişo, da ku van maddeyên teger ji destê xwe pak bikî.



Gava nexweş bikevî li malê bimîne!

Gava nexweş bî li malê bimîne. Hingê nexweşiya xwe li kesên din nalewitînî.



Maddeyên vegirtina nexweşiyê li her derên hawîrdora me heye.

Pakgirtina destan awayeke herî hêsan e bo parastina te û kesên din ji nexweşiyên.

Riya belavekirina vegirtina nexweşiyê ya herî normal, bi destê mirovan çêdibe.

